



HÊVI

kovara kurdi ya zarokan

Hejmar: 2 Adar/1981





HÊVÎ

kovara kurdi ya zarokan

Hejmar:1 Sibat/1981

-TÊXISTINÎ-

TÊXISTINÎ

NEWROZ PÎROZ BE.....	:2
DI HEFTEKÎ DE ÇEND ROJ HENE...	:4
HEYDEN EM HESAB ÇÊKIN.....	:5
GURIYE KEVOKVAN.....	:6
BRÛSK û FEXRO.....	:11
KEÇIKA PIÇÛK.....	:15
XAÇERÊK.....	:16



NEWROZA WE PÎROZ BE

Geli hevalan,

Beri, pîr beri bûye. Bav, bapîr û dapîrên me ji neditine. 2593 sal beri. Ew çax çaxa Deheq bûye. Lî rojhelata navîn Dehaq, hîkumdareki xedar, nenas û nekes bûye. Hîn kes dîbêjin deheq hîkumdarê kurda bûye. Lî gor gotînan dîbêjin dî laşê Deheq de kul û birin derketine. Wi, rojê serê du zarokan jêkiriye û mejiyê wan dî kul û birinê xwe daye. Ki lî dijî wi derketiye wan cih de kuştiye. Navê xwinmîji û xwinrî ji ya Dehaq lî rojhelata navîn bela bûye. Dehaq, zîlm û tada xwe roj bî roj zêde kiriye. Lî hember wi ji bixudê nefreta xelkê ji, roj bî roj zêde û fire bûye.

Hesinkareki kurd hebûye.Navê wi KAWA bûye
Kawa meroveki jir,rast û mêrxas bûye.Gelê x1
zan û bîndest pîr jî kawa hez kirine.Zilm û
tada Dehaq qet hîndî nahatiye kişandin. Roja
21 ê Adarê dî pêşengiya hesinkar kawa de,ge-
lê kurd lî dijî Dehaq serî hîldîde avêt ne
ser qesra Dehaq.Wî girtîne û textê zîlmkari
yê serberjêr kirin e.Gel serketîna xwe ya dî
jî Dehaq û dîlşayi û evînên xwe bî pêti, bî
gurkirîna agir dane hev.jî vê rojê heta iro
her şevên 21 ê edarê lî ser çiyân,lî ser ba-
nan û lî her çiyên bîlînd kurda agirê newro
zê vêxistinê û newrozê pîroz kirine.Her sal
lî kurdistanê agirê newrozê tê gur kirin û
geş kirin.

Îro,ev hikûmetên ku kurdistanê dî nav xwe
de parve kirine,pîroz kirîna Newrozê lî kur-
distanê qedexe kirine.Lê disa jî,mêr û za-
rok girtîna xwe û kuştîna xwe didîn ber çar-
vên xwe û dî bîn hoyên pîr giran û dizide
cejna newroz pîroz dikin.Agirê newrozê vêdî-
xîn,strarên azadî û evintiyê dîsitrên.Kurdên
ku lî derê kurdistanê jî dijî şeva 21 ê Ada-
rê newrozê pîroz dikin.

Hevalên Hêja û Jir,
Newroza we pîroz be.

DI HEFTEKÎ DE ÇEND ROJ HENE?

Bavê zelalê dî heftê de du roj lî malê ye. Ango naxebite û nare kar. Rojeki bavê Zelalê disa neçûbû kar. Zelalê jî bavê xwe pîrs kîr:
-Bavo çî ma tu do û iro neçûyi kar?

Bavê wê bersiv da:

-Keça mîn, canîka mîn dî heftê de em du roj betalîn. Ev roj rojên hêsa bûnê ne.

Zelal jî bavê xwe pîrsî:

-Hefte çî ye bavo?

Bavê wê:

-Keça mîn a hêja, jî heft rojan re hefte tê gotin.

Zelal:

-Bavo, tu kari jî mîn re navên wan heft rojan bêji?

Bavê wê:

-Bû. Ezê bêjim û jîmart:

1-Şemî

2-Yekşem

3-duşem

4-sêşem

5-Çarşem

6-Pênçşem

7-În

Du, sê caran navê rojan got û Zelalê ji jî devê wi girt.

Dî dawiyê de bavê wê:

-Heydê tu tenê bijmêre. Ez te bibinim.

Zelalê dest bî jîmarê kîr. Rojan jîmart û rast jî jîmart. Bavê wê, wê kîr hemêza xwe û ramisa:

-Her bijî keça min a jêhati.

Heydê zaroknê, em jî navên rojan bihev re bijmêrin:

1-Ş....., 2-Y....., 3-du....., 4-sê....., 5-Ç....., 6-pê....., 7-Î.....,

HEYDÊN EM HESAB ÇEKIN

Jîr û Hêja xwişk û bîra ne. Herdû jî derî dibistanê. Bavê wan jî wan pêûs tîne, malê Dî pakêta jîr de pênc û dî pakete Hêjayê de jî sê pêûs der tî. Gelo em pêûsên jîr û yê Hêjayê bîkin serhev, hemû dîkî çênd pêûs? Heydê hevalno, em behev re vê pîrsê çêkin:


Pêûsên Jîr: 5

Pêûsên Hêjayê: 3

5 û 3 em binivsinin.

5+3: 8

Pênc û sê dîke heşt.



Heydê hûn jî jî nuh ve binivsin û hesab bîkin. Ka gelo raste.



GURIYE KEVOKVAN

Dapira Evin, ba zarokan kîr:

-Zarokno, wern em lî xevroşka xwe ya dî nivî de mabû dom bîkîn.

Zarok çûn lî dora wê rûniştin. Dapira Evin dest bî xevroşkê kîr:

Û lêdanek xweş jî lî Guri kîrîn. Bî vê jî qayîl ne bûn nîgê dolaba diya Guri ya extiyar jî şîkandîn. Pîştî ku kaxetên lî pacê le fandi jî qetandîn, rabûn çûn.

Guri, jî ber lêdana ku xwariye, nîkarîbû hefteki jî ciyê xwe rabe. Dayîka wiya pîr jî alîki her roj melhema tine lî birinê wî dîke û jî aliyê dîn ve jî xwe jî paşê re xweş dîkîr. Wexteki şûnda, pîştî ku Guri parî re het bû, rabû, jî bo ku bîhna xwe firebîke der ket bexçe, û lî binê dara tuyê rûnişt. Dî fikirî dîgot, ka ezê kevokên xwe lî ku veşêrîm Hê dî nava vê fikirê dabû dengeki dî ser serê xwere bîhist. Nîhêrt ku du kevok lî ser dara tuyê bî hev re diaxafîn:

"Xuşkê, tu vi lawîkê jêr nas diki?"

"Na, nasnakim xuşkê"

"yê ku dilê qiza paşê ketiyê ev lawîke."

"Ev e?"

"Bî emrê paşê, wezir miroven xwe şandiye û hemi kevokên vi lavîki daye kuştin. Û heta ku bêji bes lî lawîk ji xistine. Tu nabini dî çî halidaye rebeno. Binher niha ji lî ser kevokên xwe yê miri sekîniye, dîfîkire dibê ka ezê wan lî ku weşêrim"

"Başê, çîma dîxwaze kevokên xwe weşêre?"

"Lê çî bike?"

"Tu zani ku emê niha ji vîra bîfirin herin. Gava em bîfirin ji vê dara tuyê wê çar pel bîweşin. Lawîk van her çar pela bigre bîde bîzîna xwe û şîrê bîzînê bîdoşe dî ser û stuyê kevokê xwe yê miri bîde, wê kevoken wi hemi sax bîn, hîm ji wê wîlo bîvîn ku tu işê kevokên dî nîkarîbîn bîkîn, ewê bîkîn"

"Ax, ax. xweziya vi lawîki gotinê te bîbî - hîsta û tê bîgîhîsta."

Kevokan dî nav xwe da wîha axaftin. Gava duwra, firin çûn. Pîştî ew firin ji darê çar pel weşîyan. Guri hê lî hewa pela xefalt û da bîzîna xwe. Çîçîkên bîzîne bî carekê tîji bûn şîr. Guri, bazda, ji hundur fîraqek ani, bîzîna xwe dot. Şîrê ku dotiye dî stû û serê kevokan dan saxbûn. Pîştî hemi sax bûn lî dora Gori dîcîvîyan.

Gava diya Guri dengê baskê kevoken bîhist bazda derva. Guri, tîştêku buye çuye hemi ji diya xwe re got.



"Lavê mîn" got diya wi"êdi dev jî vê çivik vaniyê berde. Tu carek dîn derkevi ser xanî wê paşe te bide kuştin."

"Dayê" go Guri"Van kevokên mîn ne wek kevokên ku tu zani ne. Ku bawer naki binihêre, bî çavê xwe bibine."

Vegeriya ser kevokan û got:

"Heylê kevokên minî xweşik, tîştêki bakîn ,
hîm jî bîra vê dapîra min bawer bike."

Kevok serî dan hev, dî nav xwe de tîştêki
axaftin, û duv ra bî hewa ketin çûn. Gurî jî,
diya wî jî şaş bû man. Qederekî pang lê tu
xeber jî kevokan derneket.

"Lê, a ku kevokên te yê xweşik bakîn ev bû
A te di, gişê dev jî te berdan û çûn" got di-
ya wî.

Lê hê axaftina xwe xelas ne kiribû kevok
jî jorda xuya bun. Lî ba wan kumîkê jî ku-
lav hebû. Hatîn, kumîk lî ber Gurî danin.

Diya wî got:

"Ooo, ev xelatek pîr bî rûmetê. Hela têxe se
rê xwe ka wê lî te bê?"

Gurî kumîkê kulav xîst serê xwe;

"Çewa bûm dayê, lî min hat an na?"

Diya wî şaş bû:

"Tu lî ku yî lawê min?"

"A way lî vîrîm dayê, lî vîr."

ê dê lawê xwe ne dit, got

"Hela wî kumîkî bîde mêze kîm"

Gurî, kumîk jî serê xwe derxîst, da diya xwe
Diya wî da serê xwe. Diya wî da serê xwe lê
îcar jî Gurî pîrsî:

"Daye, tu lî ku yî dayê?"

Diya wî get deng nekîr.

Gurî, ecebmayî lî dora xwe mêze kîr. Jî niş-
kave dengê dolaba diya xwe bîhist. Bazda odê.
Çî bîvine? Dolab bî serê xwe digere, hîriyê dî
rêse. Wê caxê Gurî marîfetê kumîkê kulav fam
kîr. Tu ne bê kî dixê serê xwe, Kumîk wî jî
ber çava wînda dîke.

"Dayê"got e"Bes hat fam kîrîn.Ka kumîk bî-
de,ez biçim jî bo xwarînê tîştêkî bîvînîm.Ez
dikim jî birçîna bîmrîm"

"Lê belê şertêkî mîn heye,"got diya wi.

"Jî mîn re sont bîxwe,tê destê xwe ne di
malê heram,ezê kumîk bîdîm te"

"sont.Ez destê xwe nadîm tîştêkî heram da-
yê."

Pari wêde qonaxa Heci Eliyê caw ter hebû.
Heci Eli,xwediyê çend kargehan bû.Çend sed
karkerên wi,dî xonaxê de jî birek qewraşên
wi hebûn.Gurri hîm dimeşîya,hîm jî dîramiya
"Eê ê bîrakê Gurri,ka bîrame,malê vi Heci
Eliyi jî te ra helal ê an herame?Heci Eli vi
mali mîlki vi pereyi jî ku peyda kîriye? Jî
kargehên xwe?Başe,dî kargehan da ew xebîtiye?
Na?Tew Heci Eli destê xwe jî ava germ na xe
a sar.Qet destê xwe na de tîştêkî,hew kara
ku jî kargehan tê dawê bêrika xwe.Û ya dî
têr kêfê dîke.Başê,vê qezenca ewqas pîr, bî
çî awayî jî ku pêk tê?Ka serê xwe bîxebîtine
û bersivên rast bîde pîrsên ku ezê bîkîm. Ku
mîrov ne xebîtin çî bî kargehan tîn?Tîn gîr-
tîn,ne wîlo?Pîştî ku bê gîrtî cardî qezenc
jê tê ?

(dûmahîk heye)

BRÛSK Û FEXRO


Brûsk tevi dê û bavê xwe, lı gund rûdınışt.

Bavê Brûsk cotkar bû. Perçak erdê wi hebû. Têda tene û bistan dıçand. Beri çend sala, dı nav erdê wan da şitlek tuyê jı xwe ber şin hatıbû. Wê demê şitlek biçûk bû, tu zırara wê ne dıgıhişt wan. Lê sal dı sere derbas bûn, ew şıtla biçûk, bû darek pır mezın û zırara wê gelki dı gıhişt wan. Dara Tuyê hım mezın bûbû û hım jı gelek cih gırtıbû. Jı aliyê dın ve jı ne dıhiştroj bıde ser bistanê wan. Jı ber vê yekê jı, hemû bistanê wan, jı bê rojiye hişk dıbûn. Ya dın vê darê qet tu salê jı tû ne dıgırt. Dı gotın ev dar nêr e, loma tuya nagre.

Bavê Brûsk, dıxwest ku vê dara bêxêr bıbıre. Lê çavê wi ne dıbıri ku dest bı birına wê bıke. Dıgot dar pır mezın bûye, ez nıkarım bıbrım.

Hevaleki Brûsk hebû, navê wi Fexro bû. Fexro her roj dıhat ba Brûsk û tım bı hev ra dıçûn nav bistanê wan. Rojekê cardın her dû bıhev ra çûn nav bistanê. Demekê dı nav bistanê da geriyan û hatın, lı bın darê rûnıştın. Brûsk, dest bı axaftınê kır û got: -Vê dara bêxêr pır zıra rê dıgıhine me, na hêleroj bıde ser bistanê me. Dıvê, em wê bıbırın.

Fexro got: -Başe de rabe em hılkışın ser, pelê wê û çılopekê wê jêkın, bışkının, pêre wê roj bıde ser bistanê we.



Brûsk:-Nabe,bı jêkırına pelan û şıkandına çılopekan,dar hışk na be û roj ji wê ne de ser bistanê me.

Fexro:-Na wê bibe,pêwiste ku pelê darê jêkın,pêre rojekê emê darê bıbırın.

Brûsk:-Hevalo,heta ku em darê jı kok da ne bı rın roj na de ser bistanê me.Û tu iro pela jê ki wê sibê cardın pelê nuh bıgre.

Fexro:-Ma qey tu ditırsı hılkışı ser darê?Ezê bı tenê herım,hemi pel û çılopekan jêkım.

Brûsk:- Na ez na tırsım,lê belê bı jêkırına pelan,dar ji navê ra na be.Û ya dın,em nıkarın hemûyê pelan jêkın.Dema ku em,darê bıxının wê pel ji gış pêre herın.

Fexro:- Ha min zani bû tu ditirsi,ango tu di-
bêji,belbi ez bikevim.

Bûsk:-Hevalo,ger armanca me xistina darê ye ,
ji mer yan Balte,yan ji birekek lazime.Ji va-
na herdûya yeki divê em peydakin,paşê dest bi
birina darê bikin.

Fexro:-Tu çuqa kûr û dûr difikiri.Heta ku em
herin birekê binin,emê nivê pelan jêkin. Ya
din ji,em nikarin vê dara tu di bê ecêp: bi
birekê bibirin.Him qeveta me lê nayê,him ji,
wê pîr wextê me bistine.Bi seeta,bi roja em
ê li ber bîdîn û xwêdanê da bîminin lê pelek
ji wê jê ne keve.Ev kareki pîr dirêje.Ya baş
û rehet,ka em bi darê da hilkîşin û dest bi
jêkirina pela bikin.

Brûsk:-Na wele ez hîlnakîşim ser darê.Va ez
dîşim birekê binim.Dibe ku,dereng bê birin ,
lê zû-dereng ezê wê bîbirim û ezê wer bîbi-
rim ku,wê idi qet hêşin ne be.

Brûsk:-Wîha got û bi rê ket,ku here,birekê
bine.

Fexro:-Tu yê nuha bîbini,derbên mêran çawane,
ezê darê çawa birûçikinim.

Gava Brûsk,vegeriya,Fexro bi darê da hildî
perîki.

Brûsk:-Hevalo ne çê,tu yê bikevi,were vegere
alîkariya min bike.

Fexro:-Mêze Brûsk çawa pel jê dîbin.Nuha ezê
darê rût bikim.De ku tu ji kari tîştê te birî
ye nişani min bide!Yê min vaye li ber çawa ye

Brûsk:-Ewana çend pelin,dî be ku tu karîbi

çend pelê jêrin jêki, lê dar ne ew çend pelê jêrin tenê ye. Ew pelê ku tu jê diki û pê pişî ka xwe dinepîxini, wan pelana ba ji dixine.

Fexro:-Belê tê weni bêji. Ji ber ku nikari hîl kişî ser darê, karê mî biçûk dibini.

Brûsk:-Hinekî sebîr bike.....

Brûsk hin peyva xwe ne qedandî bû, gurmînek mezîn hat û niherî ku Fexro li erdê di çene (di perpîte). Brûsk çû ser, xwest ku rake, lê tu hal tê ne ma bû û çeng davêt. Jê ra got; "Mî ji te re ne got tuyê bikevî"

Fexro bî dengêki gelki hêdi û bî nalin go:-Ma destê mî qerimî û mî nikaribû xwe bigirta. Vê peyva got û çavê wî hate girtin.

Brûsk bistiket şûnde cardîn vegeyriya ser darê û karê xwe berdewam kir. Dî xwêdanê da reş û şî bûbû, lê belê cardîn jî birek jî darê ne dîkşand. Her ku birek li darê dibîr û dani, dar jî bî da dihejiya. Qet hal dî darê da ne ma. Go gurm û ket erdê.

Dar dî qurmê re hatibû birin.




KEÇİKA PIÇOK

Yê ku lî deriyan dixe ez im
deri bî derî.
bî çavên we na yim ditin
xuya na bin bî çavan mîri.

Bû qasi deh salan
mîrinê lî HİROŞİMA.
ez keçikeki heft sali
mezın na bin zarokên mîri.

beri porên mın pêketi
çavên mın pijya û şewiti.
ez bûm kulmeki xweli
bayê lêxist û tevda biri.

N.Hikmet



çep ber bi rast)



(2)
(ji jor ber bi jêr)



(3)
(ji jor ber bi jêr)



(4)
(ji jor ber bi jêr)



(5)
(ji jor ber bi jêr)



H Ê V I :

ADRESS:

Kovara Kurdi ya zarokan
Kurdish children magazine
Kurdisk barn tidning

Hêvi / BOX 5034 16305
Spånga/SWEDEN
Postgiro, 439 33 42-3

PRIS: 3 kronor / SUBSCRIPTION-ABONE: 30 kronor per år